

Geya di bin keviran de namîne!

Rêberê Silivî

Kuro wa Silo..!

De ka were cem
min da em li ber
siha vî dîwarî qasekî
rûnin, ji xwe re basa
dengûbasên vê
dinyayê bikin, ka



çi heye, çi tune ye. Ma çi bela te ye vê havînê tu ketiyî qulika xênî malava?!..

Silo ji hundir derket û hate nik Xelo, silav dayê û li kêleka wî rûnişt. Qotiya tûtînê ji berîka xwe derxist, çixarak jê pêça xiste tîrikê û agir berdayê, dû û dûman bi ser serê xwe xist, û got:

-Ha Xelo...Vaye ez hatim, tê çi ji me re bêjî, çi ne bêjî?. Ez pêjna wê yekê dikim ku hin gotin di bin zimanê te de hene, de ka bêje bê çi di tîrikê te de heye, ez li te guhdar im.

Bi ken Xelo got:

-Bi Xwedê û pêximber gotina te rast e...Îro danê sibehê ez li bajêr bûm, li civatekê hate gotin ku dibe nêzîk fermana 49an bête guhertin...!!Ne tenê wilo, belkî ew ji kokê ve rabe. Dema min ew gotin bihîst, ji kêf û şahiya dilê xwe, min bawer nedikir ku ez bigihime gund da mizgîniyê ji te re bînim. Eger ev gotin rast be, tê karibî xaniyekî li bajêr ji kurê xwe Cano re bikirî li ser navê wî tomar bikî û wî tê de bi jin û mal bikî. Bi rastî, ji dil û can kêfa min hat. Ma tu çi dibêjî Silo?!

Silo got:

-Kekê Xelo, tu rast dibêjî, ez ji te bawer dikim, lê mixabin, gotina bav û bapîran ya dibêje "**Xweş xeber e, lê min jê ne bawer e**" tê bîra min!.Bi Xwedê û pêximberan, ez bi xwe nema hîc tistekî ii gotin. soz û pevmanên

karbidestên vê dewletê bawer dikim. Baweriya min nayê ku ewê ji bo me Kurdan qencyekê bi tenê jî bikin, yan ji derd û kulên me re, ji birînên me yên kûr re li hetwan yan melhemekê bigerin!! Ta ji wan tê, ew me diguvêşin da xwîna me biwerive rewa di laşê me de nemîne, her ew berê me didine çamor û teqanê da em tê de noq û winda bibin!!.. Xelo ma qey hêj baweriya te bi gotinên wan tê? Ma qey nayê bîra te beriya çend salan, piştî dora 50 salî ji nû ve ew li xwe hay bûne ku ne heqî li Kurdên ku nasnameya wan ji wan hatiye kişandin bûye û qaşo nêzîk ewê wî mafê wanî rewa li wan vegefinin! Lê xuyaye "**Gotinên êvara dikevîne qulên dîwara**"!!.., dîsa weke her car, soza xwe xwarin!.

Xelo yê reben siyaset -miyasetê nizane, lê tiştê ew dizane li ber çavan e ku çavsorîyeke bê sînor li Kurdan dibe, ji ber biryar û kiryarên karbidestan nema nan bi dest wan dikeve, ne jî debara wan dibe. Bi dehan malbat bi hev re bar dikin, gundên bav û kalan li şûn xwe dihêlin û diçin bajarên mezin, li wan deran, ew toşî hemî cûreyên perîşanî, xizanî û windabûnê dibin, xulamtiya xelkê dikin!!...Ew di dilê xwe de dibêje: Hema bi xwedê û pêximberê(Umetê) gawir jî vê yekê nayinin serê mirovan!!...Xelo yê belengaz, di nava gumanan de kûr û dûr çûbû dema Silo jê pirsî:

-Ha Xelo biracan ma gotina min ne rast e?!

- Kekê Silo, bi Xwedê tu rast dibêjî, lê ez belengazê xwedê hema ku gotineke xweş ji kê dibihîzim, zû bi zû ez bawer dikim. Tu dizanî ku xwendina min jî tune ye, hema te çend pitik xwendine, tu cilika xwe ji avê derdixî!!.. Lê keko, pêşiyên me gotine "**Geya di bin keviran de namîne**" û piştî zivistanê Buhar e!.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê
me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**